

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

KURDISTAN  
KURDIST  
KURDISKA  
FÖRBUNDET

www.dawx.com  
Dewleta Şerî  
Le xizmeti  
Dewletê da ye

11/83

## NAVEROK

Bersiva Wezirê Derveyê	
Welat.....	3
Bangewazeki Hawbeş.....	5
Kampanya Komela Niviskarên Swêd ji bo Beşikçi.....	6
Kurtenivisarek li ser zîmanê kurdi yê nivisandi.....	7
Destani Dêrsimi .....	10
Rêwetike 80 salî.....	12
Cejnêki Erxewani.....	15
Komela Tiyatroya Kurdi... ..	17
Ma ev qedera min e?.....	18
Dewlet,Platon û ilim.....	20
Xaçerêz.....	22
Mendalê Mamoste.....	23

○  
Berpîrsiyar

**A. RIZA ALAN**

Pergala Rûpelan

**A. M. GILLY**

Raxistina Nivisaran

**SEYRAN û GULBAHAR**

Redaksiyon

**KEYXUSRO SÎPAN-MAHMÛD  
LEWENDÎ-BENGÎN BOTANÎ  
ŞORIŞGÊR ESKERÎ-ROZA SEYRAN**

○  
**B E R B A N G**

*Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Rıza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.*

**ADRESS**

*Kurdiska Riksförbundet,  
Tunnelgatan, 14, 3 tr.  
111 37 Stockholm/SWEDEN  
TEL : 08/ 11 23 42*

*Prenumeration: Medlemmar  
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.  
Postgiro: 64 38 80-8*

## — DAZANINEK —

### LI SER NAMA İSMAİL BEŞİKÇİ

Dengê Komal beri nuha bi çendeki nama İsmail Beşikçi, ya ku ji UNESCO'yê re nivisandibû wek pirtûkekê çap kir.

İsmail Beşikçi, bê şik, ji aliyê hemû xwendevanên Berbangê ve têt nasin. Beşikçi, bi pirtûkên xwe yên ilmi, yên li ser Kurdistanîya Turkiyê; bi têkoşîna xwe ya li dîjî nijadperestîya dewleta Turk; bi deşifrekirina siyaseta û ideolojîya dewleta Turk li Kurdistanê û bi durustî û mêrxasîya xwe ya ronakbîrî ve, ne tenê ji aliyê hemû Kurd û Turkên pêşverû ve, lê li derveyê welatê jî di nav bir û raya (efkari umûmî) demokrat û humanîst de gelek çenc têt nasin.

Helbet, dewleta Turk ya kolonyalist jî, li hember ronakbîrîyê ev çend mêrxas û rast çavên xwe tu carî neneqandîye. Lê hatîye xezebê û wi bi salan mahkûmê zindanan kirîye. Beşikçi jî li hember xezeba dewleta Turkî faşîst tu carî serê xwe dananîye û lîberxwedana xwe her domandîye. Ji lew re, di nav pêşverûyên Kurd, hetta Turk û bîyanîyan de jî, tu kesekî ku hurmeta Beşikçi negre, tune.

Pêşgotina pirtûka jorin, ku bi sernivîsa " ji Beşikçi re hurmet " û bi imzeya O.K. hatîye nivisandin, bi notekî ve diçêde. O.K. di vî notî de dibêje ku me (karbidestên Federasyonê) nehiştîye ku nama Beşikçi di daktiloya Federasyonê de bêt nivisandin. Ji ber hurmeta me ya ji Beşikçi re, em xwe mecbûrê bersivdayîmê dibînin :

Ji tu berpîrsiyarên Federasyonê re (ne endamên Komîta Karger, ne jî endamên Redaksiyona Berbangê) behsa nama Beşikçi nehatîye kirin.

**FEDERASYONA  
KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD  
KOMÎTA KARGER  
REDAKSIYONA BERBANGÊ**

**B E R B A N G**


*Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyonê Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abonahî : 50 Kron, 30 DM.*

**NAVNÎŞAN**

*Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.  
111 37 Stockholm/ Sweden.  
Tel : 08 / 11 23 42  
Postgiro : 64 38 80-8*

# WEZIRÊ DERVEYÊ WELAT :

LENNART  
BODSTRÖM  
WEZIRÊ  
DERVEYÊ  
WELAT  
YÊ  
SWÊD



“HUKUMETÊN TEHRAN Û BEXDAYÊ  
DIXWAZIN TEVGERÊN KURD LI DIJÎ  
HEVÛDU BI KAR BÎNIN ”

SÊ PARLAMENTERÊN PARTIYA ÇEP A KOMUNÎST, VPK, OSVALD SÖDERQVIST, EVA HJÄLMSTRÖM Û BERTIL MÅBRINK BERÎ NUHA BI ÇENDEKÎ, CIHÊ CIHÊ, JI WEZIRÊ DERVEYÊ WELAT, LENNART BODSTRÖM HIN PIRSAN KIRIBÛN. PARLAMENTERÊN VPK, LI SER REWŞA KURDAN, LI TIRKIYÊ, ÎRANÊ Û IRAQÊ, DÎTINA HUKUMETÊ DIPIRSIN Û LI HUKUMETA SWÊD DOZA PIŞGIRI Û ALİKARIYA GELÊ KURD DIKIRIN. NIVÎSARA JÊRIN BERSIVA WEZIRÊ DERVEYÊ WELAT JI BO HER SÊ PARLAMENTERÊN VPK YE. MIXABIN, BERSIVA WEZIRÊ DERVEYÊ WELAT, LENNART BODSTRÖM, YEK JI BEYANÊN HERÎ NEGATÎV, YÊN KU HETA NUHA LI SWÊD HATINE DAYÎN E. Û EV YEK, LI SER POZÎSYONA SOSYAL – DEMOKRATÊN SWÊDÊ MERIV GELEK DIFIKIRÎNE. EM, JI BO AGAHDARÎ, BERSIVA BODSTRÖM PÊŞKÊŞI XWENDEVANÊN BERBANGÊ DIKIN.

Bersiva pîrsa Bertil Måbrink derbareya hîn tedbirên alikariyê jî bo eqliyeta kurd lî Tirkîyê, pîrsa

Oswald Söderqvist derbareya rewşa kurdên Iraqê û pîrsa Eva Hjälmsström derbareya hîn tedbirên alikariyê jî bo kurdên Îranê.

Serekê (a) hêja !

Bertil Mabrink jî min pîrsi: Hukumet, jî bo piştgiriya eqli-

yeta kurd lı Tırkiyê, xwe ji kija-  
jan tedbiran re amade dibine.

Oswald Söderqvist ji jî mî-  
pîrs kîr: Hukûmet lı ser rewşa  
kurdên Iracê çı dıfıkire û sedemên  
bı paş ve vegerandina mul-  
teciyên kurd ji Iracê, çı ne.

Dawi ji Eva Hjalmstrom ji  
mî pîrsi: Hukûmet, jı bo alika-  
riya kurdên İranê dıxwaze kija  
tedbiran bigre.

Ez bersiva her sê pîrsan ji dı  
carekê de didim.

Lı Tırkiyê, rejima leşkeri ya  
mewcûd jı bo kurdan, wek grû-  
beke gel, qet tu guherinekê bı  
xwe re ne anıye. Ev, jı bo kê-  
zêde 7 milyon kesên ku lı Ro-  
helatê Tırkiyê gelê heremê  
pêktinın wusa ye. Ev kes, bı  
şertê ku dewleta Tirk û zımanê  
turki qebûl bıkin, dı prensip de,  
wek yê dın xwediyê imkanên  
wekhev in, imkanên xwendinê,  
memûriya dewletê û hwd. jı bo  
kesên ku dı xebatên wusa de  
beşdar bûne/dıbin ku lı hember  
yekperçeyiya axa welat tehdit  
tên qebûl kîrin, rewş nuha dij-  
war buye.

Lı gelek bajaran, lı hember  
endamên PKK (Partiya Karke-  
rên Kurdistan) û rêxistinên dın  
yên kurd ku jı bo dewleteke  
kurd i serbixwe dıxebıtın, mah-  
kemên kitlewi dom dıkin. Hın jı  
van tedbirên hıçqı, hın beri  
darbeya leşkeri hatıbûn destpê-  
kîrin.

Bı tevayi, lı ser pîrsa mafên  
mırovi lı Tırkiyê, divê jı pozis-  
yona hukûmeta Swêd tu şık ne-  
yê kîrin. Me dı gel hın tıştên  
dın ve Tırkiyê, jı Komisyona  
Mafên Mırovi ya Ewrûpayê re  
gili kîriye.

Irac ew welat e ku daxwazên  
kurdan jı bo otonomiyê, lı wê  
der bı salan xurtırin û heri ser-  
keti bûne. İntiba ew e ku iro ge-  
lek kurd - lı hember daxwaza  
wan be jı - amade ne ku dı nav  
cıvata Iracê de, jıyaneke heta  
dereceke kış xwedi - şexsiyet


qebûl bıkin. Her çıqas otonomi  
bı sinor be jı, mafên ku kurd lı  
vê der bıkar tının, lı tu welatên  
dın yê ku eqeliyeta kurd lê dıji  
tunene.

Oswald Söderqvist dıxwaze dı  
pîrsa xwe de idia bıke ku şerê  
dı navbera İran û Iracê de bı  
awayeki taybeyi zerarê dıghine  
gelê kurd. Jı ber ku beri her tış-  
ti lej lı herema kurdan tê kîrin.  
Ev tam rast nıne. Dı sala dawın  
de, şer bê tır bı aliyê Başûr ve  
şıqtıye. Dıgel vê yekê, tabii ye  
ku neticên şer, wek gelên dın  
zerarê dıghının kurdan jı.

Rewşa kurdên İranê, dı sala  
yekem ya rejima Xumeyni de  
ber bı başiyê ve dıçû. Lê kirda-  
yetya merkezi nuha sıyaseta  
xwe ya lı hember kurdan dij-  
wartır kîriye. Dijayetyên dı  
navbera İran û Iracê de rê dane  
ku hukûmetên Tehran û Bexa-  
yê dıxwazın, ku her yek lı wela-  
tê dın dijınayiya tradisyonel  
ya dı navbera tevgerên kurd  
yên militan û kirdayetya mer-  
kezi de, lı dıji hevûdu bıkar bı-  
nın. Ev peywendi, lı herdû alı-  
yên sinor jı, rewşa herema  
kurdan karakterize dıke.

Jı rewşa kurdan deranina hın  
neticeyên umûmi û ewle dijwar  
e. Ev, (rewşa kurdan) lı gor wela-  
tê ku lê dıjin û lı gor zeman  
dıgihure. İnfomasyona ku lı  
ser paşve vegerandina multeci-  
yên jı vê heremê, jı mırre hatı-  
ye ev e - ku wek hemû kesên  
dın yê ku jı ber sedemên sıyasi  
dıxwazın lı Swêd bıminın - lı ser  
rewşa şexsi ya kesê ku muracat  
dıke, lêkolinek gelek bı haydari  
tê kîrin. Tabi, ew kesên ku dı  
muracata wan de sedemên bı  
bingeh hebın, bı paş ve nayên  
vegerandın. Wezira Bıyanıyan  
Anita Gradin nihêrina derheq  
politika ilticayê jı bo kesên ku  
jı İran û Iracê tın, roja 5'ê  
Nisanê dı bersivekê de pêşkêş  
Ola Ullsten kîr.


HER SÊ  
PARLAMENTERÊN  
PARTIYA ÇEP  
A KOMUNİST



**Oswald Söderqvist,**  
Parlamenter. Wek dostê  
Kurdan tê naskirin.



**Eva Hjelmström,**  
Parlamenter û Endamê Mer-  
keza VPK



**Bertil Måbrink,**  
Endamê Merkeza VPK û Se-  
rekê Gurûba Parlamentoyê.

## BANGEWAZÊKÎ HAWBÊŞ

Le nê wan nîwêneri Yekitiy Niştîmaniy Kurdistan û nîwêneri Parti Komonisti Eraq.  
Bo hemû hêze çekdarekani herdû la :

Dawakari ragirtîni şer le nê wan herdû la da ekeyn. Çünke em rûdawe diltezenaney em duwayiye karêki selbi kirdote ser bizûtnewey niştîmani dîji rîjê mi faşîstî dujmîni herdû la man. Her weha karêki selbi kirdote ser bizûtnewey cemaweri. Be corêk ke dujmin em xwênriştîne be dilêki xoşewe ekat. Le katêk da ke ebuwaye xwêni em çekdarane le sengerêk da şan be şani yek beramber be dujmin birîjaye dîji rejê mi diktatori faşî sepêniraw be ser geli Eraqewe, be Ereb û Kurd û hemû kêmenetewayetîyeki tîrewe.

Nîwênerani be dû la be tundi dawakari kotayi hênan bem kuştare, her weha duwayi hênan bem bare na asayi ye le pê nawi çareserkirdîni birinekani em karesate naxoşe w geştişîni be yekxîstîni hewldani herdû lawe her weha lakani tîriş dîji siltey diktatori w le pê nawi bedihênanî amance niştîmaniyekan û bedihênanî hukmêki itilafî, niştîmani w dimokrati ke le jêr sayey da serbexoyî niştîmani w dimokratîyet bo Eraq û otonomî rasteqîne bo geli Kurd bedî bîhê nê t.

Yekê tiy Niştîmani Kurdistan  
CELAL TALEBANI

Parti Komonisti Eraq  
KERİM EHMED DAWID

10/5 – 1983

Têbîni . Em nûsrawe le ÎZGEY DENGÎ ŞORÎŞÎ ERAQEWE wergirawe le 11/5-1983

## KU XWEZÎ

Bihêrişe ax !  
Bikumişe esman !  
Ku xwezî  
Di gewriya min de bifetise

Tu metirse dilê min  
Tu metirse  
Kaniya te, şêna bîst milyon

Wê te biparêze, xwezî  
Wê te biparêze  
Kulîlkekî zildayî  
Vêna min î ji pola.

BARNAS

M. F. B A R A N

## KULMEK EVÎN

XIX  
Dilê min lêdide  
Ka - tu - lî - ku - ye ?  
Dilê min diqire  
Ka tu - lî - ku - ye ?

XX  
Dilo çî dibe raneweste  
Dilo çî dibe raneweste  
Dilo çî dibe raneweste  
Heta ez wê dibinim

XXI  
Tu ne bûya  
Nefesê min bî te tîjû ne  
- bûya  
Mêjiyê min nesekîniya bî tirêjê n  
- hingura te ve  
Bawer bike, van rêzan dê tunebûya  
- iro

# KAMPANYA KOMELA NIVISKARÊN SWÊD JI BO Î. BEŞİKÇI

I am deeply concerned that the writer and sociologist Ismail Basikci has been sentenced to 10 years' imprisonment for having peacefully exercised his right to freedom of expression. I appeal for his immediate release.

Jag är djupt oroad över att författaren och sociologen Ismail Besikci har dömts till 10 års fängelse för att han fredligt har utövat sin rätt till yttrandefrihet. Jag väddjar om hans omedelbara frigivning.

Imprimé

Par Avion

Porto  
1.60 kr.

Namn.....

.....

Adress.....

.....

GENERAL KENAN EVREN  
SEREK  
ANKARA/TURKIYE  
Dilê min gelek diêse ku niviskar û  
sosyolog İsmail Beşikçi, ji ber ku bi  
aşiti azadiya beyankirina ditina xwe  
bikarani, 10 sal ceza girt. Ez tika di-  
kîm ku ew derhal bête berdan.

**General Kenan Evren  
President  
Ankara  
TURKEY**



KOMELA NIVISKARÊN SWÊD, DI MEHA BUHURÎ DE JI BO AZADKIRINA İSMAİL BEŞİKÇI KAMPANYAKÊ VEKIR. KOMELA NIVISKARAN BI İNGİLİZÎ Û SWÊDÎ NAMEYEKÊ NIVISAND Û JI HEMÛ ENDAMÊN XWE RE BIRÊKIR, DA KU EW JI JI DİKTATORÊ TURKIYÊ, KENAN EVREN, RE BİŞİNIN. EV NAME BI ŞEKLÊ KARTPOST-TAL HATIYE NIVISANDIN Û DI RUYEKÎ WÊ DE FOTOGRAFEKÎ İSMAİL BEŞİKÇI JI GIRTİGEHÊ CİH DIGRE. EV FOTOGRAF Û KURDIYA NAMÊ LI JOR IN.



Foto: Lars Bergqvist

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd, wek salên bûri, isal ji di meşa 1'ê Gulanê de cîyê xwe di rêzên partiya çep a Komunist (VPK) de girt. Pîraniya kurdên li Stockholmê, di nav rêzên partiya komunist de û bi Federasyona Komelên Kurdistanê re meşiyên. Weki hemû welatên Rojava, li Swêd ji her sal roja

1'ê Gulanê bi sedhezaran karker mîtingê cejn dîkîn. Federasyon ji, bi koma folklorê, Behar, ve û dîgel def û zîrne beşdari mîtingê bû. Listikên kurdi yê n li ber def û zîrnê ji aliyê hezaran kes ve hat temaşê kirin. Û bi taybeti bala Swêdiyan dîkişand. Wêneyê jorin sahnayekê ji roja 1'ê Gulanê şani dîde.

1' Ê GULANÊ  
1983

# KURTENIVÎSAREK LI SER DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ YÊ NIVÎSANDÎ

*Reşo Zilan*

*Hormizgan reman atiran kujan  
Hoşan şarewe gevregevekan  
Zorkire Ereb kirdine xapûr  
Genane pale beşi şarezûr  
Jin û kenikan we dîl beşinan  
Merd aza tîlin ji ruy hewînan  
Rewîşt Zerdeşt mayewe bîdes  
Bizika nakit Hormiz we hîç kes*

"Delê: Jale Bo wa talît ?  
Delê: Le ber biramirdin.  
Gulit bo wa cuwan e ?  
Delê: Le ber dost û dujmin."  
(ji gotinên bav û kalan)

Wek ji naveroka vê helbesta çarmalîkî ya jorîn jî berpêş dike. helbest li ser tevgera vegirtina Erebên zordar e û ew çêla nehîştin û qelandina reh û kokên ayîn û toreyên ola Zerdeşt dike. Welê dixuyê, ku wek Mackenzie jî di benda xwe de destnîşan dike, ev helbest di bend û pirtûkên ku li Rojava derketine de, cara pêşîn di benda B.P. Nikitine (27) de û wek noteke têbîniyê çih wergirtiye û jê hatiye kad kirin. Di gel pir kesan, T. Bois (28) jî di benêde xwe de çêla vê helbestê dike. Heta M.B. Rudenko jî, bêî ku li ser vî perçeçermî û helbesta çarmalîkî lêkolînekê bike, wê weke "belga herî kevn ya bi kurdî hatiye nivîsandin û ji sedsala heftan maye" (29) nîşan dide.

Berî ku em awira xwe ya di vî warî de raber bikin me dîl heye ku em ji aliyê zimanzanîyê de piçekî bala xwe bidin vê helbestê. Peyvên ku tê de derbaz dibin, ji hev derbixin û wan ronak bikin.

**HURMIZGAN:** Bingeha vê peyvê - gedagahî Hurmuzd - e û bi mana "kesên ku hewceyî Hurmuz in" e. Heçî peyva -Hurmizgan - e, ji - Hurmezdgah - têt. Peyva - mizgeft - ku di kurdiya îro de bi mana "camî" tete bi kar anîn, reh û riça xwe ji peyva - mezdgah - werdigire. Herweha peyva - mes-çad - ya ku di zimane erebî de tete bi kar anîn, ji peyva

- mezigit - yan mezigîd - hatiye erebî kirin, ku ev peyv bi xwe jî ji - mezdgah - hatiye der. Paşpirtika - Hurmezdgah - carina weke "- gid" jî, ano - Hurmezdgîd -, hatiye bi kar anîn. Ji xwe paşpirtikan "- gid" bi mana - geda - ye. Peyva - gede - di hin devokên zaravê kurmançî de pir tete bi kar anîn û du manan dide. A yekemîn; kur, wek, "Gedê Sûsikê li pêşberî bavê xwe derketiye". A diwemîn; yê tengezar û belengaz, piçûk û stûxware ku hewceyî alikariya kesekî dilovan e. Wek, "Malava, çawan destên te li vî gedeyî radi-bin ? .." Lê belê, heçî peyva - Hurmizgan - e, di tore û ayî-nên ola Zerdeşt de bi mana "mizgeft û ayîngeh" ye.

**RÎMAN** : Helweşandin. Di kurdiya Silêmaniyê de -rimandin -, di ya Sineyê de -rimyan - û di ya zazî de -rijnayîş -.

**KUJAN** : Vemirandin, vekuştin, xewwe (xewa) kirin, tefandin... Di kurdiya Silêmaniyê de -kujandin -, di ya Sineyê de -kujyan - û di ya zazî de -mirênayîş -, -hewna kerdiş -.

**WÊŞAN** : Xwe jî. Di zaravê goranî û zaravên kurmançiya jêrîn de -xoyan - û di yê zazî de -xwe, xwu -.

**ŞARDEWE** : Veşartin, vedizîn. Di zaravê kurmançiya jêrîn de -şardîn -.

**GEWREGEWREKAN:** Giregirandin, mezinan. Di zaravê zazî de -giregirandin - û di yê din de -gewregewrekan -.

**ZORKAR** : Zorkar, zordar. Di farisiya kevn de -zûrehkere -.

**KIRDÎNE** : Kirine.

**XAPÛR** : Kavil, wêran. Di zaravê kurmançiya jêrîn de -kelawe - . Lê peyva - xapûr - ji ya zimane erebî -xerab - hatiye.

**GINAY** : Gihîştin. Di zaravê kurmançiya jêrîn de -geyîştin -, di yê zazî de -resayîş -, -ginayîş - (lê betir di mana "lêketin" -ê de ye) û di yê goranî de -ginay -.

**PALE** : Gund. Di kurmançiya Meletyê de -dih -, di ya jêrîn de -ladê -, -dey -, di zaravê zazî de -dew -.

di yê hewramanî de - dag - û di zimanê farisî de - deh -  
**HETA** : Bi zimanê erebî ye - hetta -  
**ŞIN** : Jin. Di zaravê zazî de - cenî -, - cinî -,  
 di yê goranî de - jenî -, di zimanê farisî de - zen -, di iranîya  
 hev de - cenî - û di zimanê rûsî de - jenşîna -  
**KENİK** : Keç, qız, kiç. Hin Kurmanc - keyn - jî  
 dibejin. Di zaravê kurmanciya jêrîn de - kiç -, - kîj -, - ke-  
 nişk -, di yê goranî de - kinaçê - di yê hewramanî de - kina-  
 ke -, di ye zazî de - keynek -, - kênek -, - keyna - û di zimanê  
 farisî de - kenîzek -.  
**WE** : Bi. Di zaravê zazî de - bi -, di yê din de  
 - be - û di farisî de - be -.  
**DÎL** : Dîl. Hema hema di hemû zaravan de ey-  
 nî ye. Herçendî peyva - hêşîr - jî têtê bi kar anîn jî, lê ew bi  
 zimanê erebî ye.  
**ŞÎNA** : Birin. Di zaravê zazî de - berdiş -, - ber-  
 dene -, di yê din de - birdîn - û di zimane farisî de  
 - burden -.  
**MÊRD** : Mêr, mêrxas, malxwê.  
**AZA** : Xweşmêr, gernas, egît.  
**TÎLÎ** : Gevizîn. Di kurdiya Silemanîye de - tilan -  
 u di ya Sineyê de - tilyan -.  
**WE RÛYÎ** : Di... de. Di zaravê kurmanciya jêrîn de  
 - le -. Bi zimanê farisî - be rûyî -, - der -.  
**HÎWÎNA** : Xwîn. Di zaravê zazî de - gwîn -, - gûnê -,  
 - gonî -, di yê kurmanciya jêrîn de - xwên -, - xôn - û di zi-  
 manê farisî de - hûn -.  
**REWUŞT** : Rabûn û rûniştin, livîn, bizivîn. Di zaravê  
 kurmanciya jêrîn de - rewuşt -.  
**ZERDEŞT** : Zerdûşt, Zeredêşt. Di zimanê farisîya nû  
 de - Zerdûşt - û di iranîya hev de - Zaratûştra -.  
**MANEWE** : Man, mayîn. Di zaravê zazî de - mendîş -,  
 - menden e - û di yê din de - man -.  
**BEZÎKA** : Bazdan, lezandin, bi piyan hatin... Di  
 kurdiya Silêmanîyê de - bezayî -, di ya Sineyê de - bezawî -  
 û di farisîya navîn de - bezegîh - (di mana - guneh - de ye).  
**NÏYKA** : Nake. Di zaravê kurmanciya jêrîn de  
 - nayke -.

Heçî zimanê helbestê ye, ne zaravê kurmanciya  
 jêrîn e, lê bê tir ber bi zaravê goranî ve diçe. Her çi  
 be, jî bo me pirsê herî girîng ne ev e. Lê belê pirsê  
 herî girîng ew e, ku gelo di nivîsandina vê helbestê  
 de kîjan îdeogram yan jî çend îdeogram hatine bi  
 kar anînê? Li milekî din jî, gelo tîpên wek - j -  
 - u -, - û -, - e - ya navîn çilo hatine nivîsandin? Jî  
 xwe heya bi niha tu belgên kurdî, ku bi tîpên pen-  
 lewî haibin nivîsandin, bi dest neketine. Heye ku  
 kurdî çet bi tîpên pehlewî nehatibe nivîsandin.

Wek em pê dizanin, piştî vegirtina tevgera  
 Ereban û bi kotekî misilmanbûna Kurdan, zimanê  
 kurdî bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Anko Kurdan  
 jî wek gelên din yê Rojhelat hêdî hêdî dest bi  
 karanîna alfaba erebî kirine û pê zimanê xwe nivî-  
 sandine. Wan, bi riya guhartin û lêzêdekirina çend  
 tîpan, dikaribûn guhartokeke alfaba erebî jî bo nivî-  
 sandina zimanê kurdî biafirînin. Reşîdî Yasimî di-  
 bêje, ku "heye ku ev helbest piştî tevgera vegirtina  
 Ereban jî hatibe nivîsandin". Divê em bêjin, ku pe-  
 yltandina (îspatkirina) vê îdiayê tiştêkî pir zor û  
 dijwar e. Nemaze îdiakirina, ku Kurdan piştî tevge-  
 ra vegirtina Ereban jî bi tîpên pehlewî nivîsandin e,  
 tiştêkî bêî bingehe e. Îdiake pûç û ne rast e.

Li alîkî din jî, gava mirov bala xwe dide çîroka  
 vê "belga dîrokî", pir pirs û pirsiyarên cihê cihê  
 derdikevin pêşîya mirovî. Her ev pirs û pirsiyar bi  
 xwe mirov bi dudilî dikin, ku mirov nikare wisan bi  
 hêsanî bawariya xwe bi rastbûna vê çîrokê û vê  
 "belga dîrokî" bîne.

Cara pêşîn em baş dizanin, ku welatê me ji sed-  
 sala 16 - an bi vir de, ji gelek zanyar, rojhelatnas,  
 îranîzan, kurdîzan, dîroknas û kavilnasan re bûye  
 mēvandar. Sîng û hembêza xwe jî xebatên wan yê  
 curbecur re vekirîye û hiştiye ku ew li xezîne û de-  
 fînên wî bigerin, li wan bikolin û hûr binhêrin. Her-  
 weha pir gerok jî li ser sînga wî bûne mēvan û lê  
 derketine ger û seyranan. Di gelê jî, divê mirov  
 bêje, ku hin ji van kesan xwe di bin xêliya zanyar û  
 gerokan de veşartine, lê belê di rastiyê de hiç pey-  
 wendiyên wan bi kar û barên zanyar û gerokan ve  
 tune bûne. Wan di bin navên cihê cihê de karê xwe  
 yê kirêt gerandine û birine serî. Ketine nav refa û  
 gorên gel, li war û wargehên behîştin ciwar bûne  
 yan jî lê hêwirîne û bi kar û barên xwe yê sîxurî û  
 casûsiya dewletên koledar, emperyalist û pîlangêr  
 ve mijûl bûne. Dîroka me û serpêhatiyên tevgerên  
 rizgarîxwaziya gelên Kurdistanê di pir waran de bi-  
 serketina kar û barên van celab "mēvanan" berpêş  
 dikin û dipeyîtînin... Di rex van celeb "mēvanan"  
 de, welatê me jî hin celeb mēvanên din re jî, yê  
 ku heyînenetewî yê gel û welêt jî bo armanceke  
 çîrêj û nepak bi kar anîne, bûye mēvandar. Dîrok û  
 serpêhatiyên gelên me, nankorî û dilreşiya van ce-  
 leb "mēvanan" jî bi me didin zanîn...

Em veşerî ser dabaşa gerokê ku di çîrokê de jê  
 têtê had kirinê. Pirsê yekemîn ev e, ku wek li ber  
 çavan e, di çîrokê de ne ji sala ger û seyranê vî ge-  
 rokî û ne jî ji navê wî têtê had kirin. Gelo çima?

A didwan, welê dixuyê ku tu werger û dîlbend  
 bi vî gerokî re tunebûye. Wî bi xwe dikaribûye ku  
 bi derwêşê li kuçek jî kuçên bajarê Silêmanîyê rû-  
 niştî re bipeyîve, pê re bide û bistîne. Gelo çi zi-  
 man di navbera wan de bû ye wasita danûstandi-  
 ne? Wek em pê dizanin, ne bes di wan deman de,  
 heye ku ev dem destpêka sedsala 19 - an be, lê be-  
 lê niha jî dîtina derwêşekî Kurd ku bi zimanê  
 îngilîzî bizanibe ne gengaz e. Na eger wan bi zima-  
 nekî din, weke erebî yan jî farisî, bi hevdu re peyî-  
 vîbin, wê çaxê dive em bigihêjin wê çînyat û bawerî-  
 yê, ku gerokê navbir yê Îngilîz kesekî rojhelatnas  
 bûye. Li xwe di çîrokê de jî welê dixuyê, ku ev ge-  
 rokê ha, ne gerokêkî adetî bûye. Anko wî dikaribûye  
 jî metnekê derbixîne, ku ew bi tîpên pehlewî û  
 çend malikên helbestê kurdî ye. Bi kurtebirî, li  
 gor xwe "kesekî bi teqîl" bûye...

Tiştêkî xuya û li ber çavan heye, ku her çi kesên



ku rojhelatnas bûne û di gera xwe ya li rojhelat de belgene dîrokî dîtine, yan ew bi xwe yan jî wêneyên wan di gel xwe anîne welatên xwe. Ew spartine yan muze û temaşegehan, yan jî pirtûkxane û muesesên zanyariyê. Lê pir caran jî ew bi xwe li ser xebitîne tiştên di derheqa wan de nivîsandine û weşandine. Lê çi ecêb e, ku heta niha jî xwerû û orjînalê vê belgê li tu cîhekî ne hatiye dîtin û ne jî peyda bûye. Me bi xwe jî, herçendî em bi salan lê geriyar, ew nedît. Heke bi rastî belgeke holê heye, gelo çima heya niha metna xwerû û orjînal nehatiye çap û belav kirin? Gelo çima xwedî û nivîsevanê pirtûka "Zarî Kirmancî" yan jî kekê wî yê gorbehişt Gîw Mukriyanî, ku bi awakî misoger pûte û

sexbîriyê (ehemiyet) didin vê belgê û di gel agehiyên misoger çêla wê dikin, xwerû û orjînalê wê nawesînî û cîhê ku ew niha lê ye, salox nadin? Bi dû re, xwedî û nivîsevanê afirandina "Zarî Kirmancî" jî kû dizane, ji ber ku tu belgeke yan jî ser û çavkaniyekê berpêş nake, ku helbestvanekî Kurd ev helbest di sala 640 - ê zayînî de nivîsandî ye? Heke wisan be, gelo çima navê wî helbestvanî nabêje? ..

Bi kurtebirî, em bi xwe gîhane wê qinyat û baweriyê, ku ev "belga dîrokî", ev helbest û ev çîrok tiştêkî duristkirî ye û ne rast e. Serî pê êşandin navê û sexte ye...

27-NIKITINE, Basile P., Une apologie Kurde Du Sunnisme in: Rocnik Orcentalistyczny, Vol. VIII, P.125 n.18 Lwow 1934

28-BOIS, Thomas O.P., La Religion des Kurdes, in: Porche-Orient Chretien, T XI, nr.2p.110, Jarusalem 1961

29-RUDENKO, Margarita Borisovna, K Voprosu o Kurdskoj Literature, in: Sbornik v Cest Akademika I.A.Orbeli Issledovanija po istorii Kultury narodov Vostoka, p.434, Moskva-Leningrad 1960



Foto: Lars Bergqvist

## FOLKLORA FEDERASYONÊ DI ŞEVÊN PIŞTGIRIYÊ DE ..

Grûba folklorê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd, di meha Gulanê de, di gelek program û şevên kurdi û şevên li diji nijadperestiyê de beşdar bû. Hin ji van şevên ku folklorê Federasyonê, BEHAR, tê de beşdar bûn ev in: Di roja 8'ê Gulanê 1983'yan de, li Universîteya Stockholmê şevê li diji nijadperestiyê hat pêkanin. Programê şevê bi listikên Koma Behar hat vekirin. Rêxistina li diji nijad-

perestiyê li Swêd, di roja 15'ê Gulanê 1983'yan de, li Stockholmê (Sodermalm Fritidsgard) li diji nijadperestiyê şevêkê organize kir. Koma Behar, bi listikên xwe yê kurdi ve di vê şevê de jî beşdar bû. Weki dîm ji, Koma Behar di şeva "pedagogên malbatên kurd li belediya Botkyrkayê" de û di şeva piştgiriya Kurdistanê de beşdar bû. (Wêneyê jorin ji 1'ê Gulanê ye).

# DESTANI DÊRSIM

## Malmisanij

### GANFIDAY DÊRSIMI

Dêrsim, kela nê gurota ya'' vanê vaje: "Eey".

Mi çiman verra geyrenê  
Xortê por siyay  
çi dayk û çi bawk,  
çi way çi bîray û cenî viyay  
kışiyay, kışiyay... nê qediyay.  
Keyney... keyney por keji  
ba' jê mî yenê,  
nor - dorê mî dej i.  
Tewa Dêrsimi,  
yew tewa kî me vajê.  
Zanayîşo kî ez zana leyro,  
mayan kemi ardi enasar laji.  
Mayan kemi ardi.

\*

Gami ena gami, se' eti ena se' eti bi,  
se' eta seqerî,  
yew yerewo teng...  
Dina xîr û xali,  
dina bê veng.  
Yew menga wusarri  
û serrî hîris û hewt bi.  
Yew vengî deket bi,  
yew vengî deket:  
Lajan ra yew laj,  
Lajê Babo y: İbrahim (1)  
kışiya Dewa Deşt de  
bi pînanî û bî dek û dolavan.  
Serrî hîres û hewt a,  
Dêrsim zimeno leyro,  
lerzî deketwa.  
Lerziyay dina,  
Fermanê ma vet fîna ganawîran,  
Cendirmey û "bitli piyade" y

dekewtê hêgan û rezan,  
banan û keyberandê ma .  
Qoçgiri dîma, Pîrani dîma,  
naray resay koyandê ma  
amey, dekewtê deşt û çolandê ma.

\* \*

Ganfîdan ra yew ganfîda  
-Aşîra Yusîfan ra-  
ze şeyta tadaya,  
xorto delalî û werante û şek,  
tern û cîwan,  
xwî dest kerd çek  
va: "La, na bînamusey nê wedariyêna !"  
va: "Law hevalênê, rawurzê la !  
ma bîgirîme heyfanê çênekanê (2) Dêrsimîjan  
kutîkanê haran ra".

\* \* \*

Amey pê hetî hewt aşîrê Xozatî  
-Xozatî persena Qerexlan ra nata wo (3)  
û aşîr û aşîrekê bîni:  
Abbasan, Ferhadan, Bextiyaran,  
Heyderan, Demenan bî ay bînan ra.  
Keyan û gomandê xwî ra qertelîyay  
bîko ko bî ko abîrîyay,  
tîmo pê mişewrîyay,  
persay zanayan û erdişpiyandê xwî.  
Diy bî damê Paşanê Osmanîyan  
weş zanaynî kî dînya - alemî  
bêbextey û fesadey karê inan,  
talan werê inan o  
ow xape, hal û karê inan bî.

\* \* \* \*

Seyid Rîza y  
ray ray cal kerdnî mirûzê xwî  
berrezîyaynî  
tersonek û serek aşîranê bêbextan ro.  
Berrezîyaynî:  
"Burr meydan o !" vatîni.  
"Ma" vatîni "wazenime kî  
bibime wayîrê xwî,  
wayîrê zîwandê xwî,  
çekandê xwî,  
banandê xwî bîme,  
xwî ser bîmanime.  
- Bê gopal /bê çopol /bê qereqol..."

Hol vatini, kerdini hol.  
 Çı fayde ki verganê bozan  
 xwî neterna bi naşt - daşt,  
 vergan tari û ta'da ejdahayan waştne.  
 Bı la' bikerey û oynikerey û rippikerey,  
 bi teyaran û bomban  
 alay bı alay dima amey.  
 Qirkerdene bi elifaba Romi  
 bı namebê "islah ve de iskân".  
 Koyana vas û villiki pullisiyaynê  
 ow dar û ber bermaynê ma vera.  
 (Hay hayiii, hay hay !...)

\* \* \* \* \*

Heto bin ra  
 bê cusi û bēnamusi vejıyay ma hetı  
 goniya bırayanê xwı rote.  
 Ha vaje, ha vaje leyro.  
 "Caran bıray,  
 serê bıray berdo mezate roto ?" (4)  
 gilli mı perri keko, roto.  
 To va: "Eey".  
 Demeyna pey  
 Raybero rezil (5) -çılka heramı -  
 Dormey Xozati de  
 Dewa Pehami ra wurışt,  
 xwı ant Bextıyaran miyan  
 bı bêşerefey.  
 Rı nê bı xwıra ey yey,  
 rı kerd bı çerme.  
 Kewt ganfıdanê Dersimi miyan  
 xwı Alışêri resna, bı mēman,  
 va: "Ez bıya veyşan û teyşan".  
 Alışêri, ver de rona nan.  
 Nişka ra Rayber wuşt ra,  
 şeşdarbi nay pıra, nay pıra.  
 Zerifa, ciwanıka ciwanıkan,  
 ageyray, hewnıyay,  
 hetı ra mat mendi, çızzay  
 labrê xwı şaş nê kerd ay.  
 "Sıma hevalê mı kıst !" va.  
 Ú cadı kaş kerdı linga şeşdarbi,  
 bı engıšta xwına bariy  
 rep kerd Efendi (6)  
 Dima, a zi kışıyay,  
 Alışêri ver de qelebıyay.  
 Alışêr: Roşenbir,  
 Alışêr, yew şêr,  
 helbestkar û tēkoşer,  
 mend bı goni û gonaşir de.  
 Mayan kemi ardi enasar laji û keyney,  
 ne kı tena bı namebê xwı,

rastıko mordem bı.  
 Mordem, ne henek a !..

\* \* \* \* \*

Bêbextey nê omareña,  
 ne yew, ne didı.  
 "İnsani şıto kal wardo".  
 Weng ra nê vajıyaya deyıra xayınan.  
 Wa Munzır vajo ke  
 Xıdırê Pırçoy senêwa hewn de Sahin kışt,  
 Serey cı berd dışmeni rê.  
 (De bê memire !)  
 Koy Tujiki ra pers kerê  
 vengê naliya domanan û cenıyan.  
 Bı hezaran mordem,  
 Geliya Iksor de  
 mexaran de mend bıy ganbo gani,  
 him veyşan, him teyşan  
 him tari,  
 tari û dermat.

\* \* \* \* \*

Niy bes nê bi ...  
 Veri,  
 pey resenan û rêzılan pêra bestı heme  
 dıma, kerre û kuçi  
 bı loqeran û velkan xemeliyay.  
 Çı Vacıxe, çı Nazımıya, çı Mazgêrt  
 estey şarê Dêrsimi bıy puç.  
 Xırabanê dınya yewbına gırewt,  
 xeberı rıştı bı zuri û reziley  
 tepışıya Rıza  
 bı lajan  
 û Qemberê Yusıfan,  
 Ali û Seyid Huseynê Qureyşan.  
 Eştê kendılan,  
 darda şendelnay  
 --ze kincê şutey--.  
 İnan vilê xwı nê ronay  
 vera dost û dışmenan.  
 Zalimon rê tepya nê day,  
 bı zonê xwinê Dêrsımki pêtkani va:  
 "Ez resena ganfıdanê Kurdan  
 û xortê Kurdan, heyfê kıştan  
 do bigirê.  
 Wa weş bo Kurdistan  
 û şarê Kurdistan !"  
 "Ez Rıza yo" vatini,  
 "Bınê lemanê, kerre û kuçanê  
 Dêrsimi de

# R Ê W Î T Î K E

*Rohat*

Cigerxwin

RONAK

DÎWAN

CAPA Y

KÎME EZ

DÎWAN.. III

WESANÊ

STCKHOLM

**SEWRA  
AZADÎ**

DÎWAN  
CEGERXWIN

2

SALA - 1973

1954

PÎRTÛKGEHA  
BAHOZ  
HJ:1

**DÎWAN  
YEKAN**

**CÊGERXWÎN**

CAPXANA BAHUZ CAPA:1:



' Seyda rast bî rast bela xwe dabû mir, beg, axa û şêxan. Jî lewra jî xwe re dijminîne xurt û dijwar peyda dîkîrîn. Carîna çih lê teng dibû. Lê, Seyda, bê perwa, şûrê xwe dî ser serê wan ra wediweşand û eşkere digote wan, ez dîkîm bi vi şûrê serê we jêkîm'. (Celadet Ali Bedîrxan, jî pêşgotîna DÎWANÂ YEKEM, 1945 Şam)

' Jî vê pêva, dî rojên tengî û zivariyê da jî, dilgeşî û comerdî jî Cigerxwin bî dîr neket. Rojêkê min ew dilteng û bêhevi nedit, çî dema lê çewmîye... tevi zivariya xwe her û her destê alikariyê dirêjî hevalû hogrên xwe kiriye'. (Osman Sebri, jî pêşgotîna SEWRA AZADÎ, 1954 Şam)

' .. dî ber xwendîna xwera xebata niştîmanî û milletperweriyê jî meşand, bî dengêki bîlînd û bêtîrs û bê pîrs, lî rîstên xwe da gazi milletê kurd kir, jî bo hişyar bîbîn, bîndestî û sîtemkariya dijmin lî ser xwe rakî'. (Hemit Dewrêş, jî pêşgotîna KÎME EZ ?, 1973 Lubnan)

' Dî dînyayê da hertîşt gorê şîrûtên dorberê xwe pêk tê, merivên rêber, serok û senatkarên mezîn jî go-raw hewceyên zeman û mekan derdikevîn, dîghên. Milletê me şairek mîna Cigerxwin derxîst, jî ber ku Kurdistan hewcedarî wî bû' (Kemal Burkay, jî pêşgotîna RONAK, 1980 Stockholm)

' Bî fikir û ramana min efrandînen Cigerxwin bî temami bî naveroka xwe va, bî hunera nivisareva, bî bedewiya nivisandîna xweva jî nivisarên gelek şairên dînyayê bî navdar, şoreşger û demokratên niha danaxwe' (Qanadê Kurdo, jî pêşgotîna ZEND - AVISTA, 1981 Stockholm)

CIGERXWÎN

## 8 0 S A L I

AK

A 4'A

YEKEM

ROJA NU

M 1980

CIGERXWÎN

**ZEND-AVISTA**

DÎWANA 5'A

ÇAPA YEKEM

STOKHOLM 1981

CIGERXWÎN

**ŞEFAQ**  
DÎWANA 6'A

CIGERXWÎN

**HÊVÎ**  
DÎWANA 7'A

"Zarokê kurd li Ermenistanê, şagirtên koma çaran gava pirtûka xweyê dersê "ZIMANÊ KURDÎ" vedikim, şîera Cigerxwin "Xwendin" dixwinin. Ewana dengê helbestvanê şorişvan dibehên, dengê nalina dilê wi bona halê welêt, gaziya wi, ku xort û keç baş dixwinin" (Casimê Celil, ji pêşgotina ŞEFAQ, 1982 Stockholm)

"... pîrsa dosti û biratiya hemû gelên cinar û tema internasyonalizmê Cigerxwin her dem dike binyata helbestên xwe. Evê mezinaya Cigerxwin û bir - baweriya wi" (Ordixanê Celil, ji pêşgotina HÊVÎ, 1983 Stockholm)

Bî çapbûna diwana dawin "HÊVÎ" va hejmara diwanên wi ghişte heftan û Cigerxwin dî nav 80 saliya xwe da, ji hev xweştir efrandinên pîr hêja raberî xwendevanên xwe kir. Hejmara rûpelên diwanên wi ghişte nêzkaya

1500 belgi. Dî nav vê rêya dîr û dirêj da, tu wext piştî wi nehate xwarê, li ber dijmin stûyê xwe nizim nekîr, newestiya, nehejiya û dî nav 80'ê salî da, dî rîya xwe da meşîya, iro jî ew li ser piyane.

Celadet Bedîrxan, Osman

Sebri, Hamid Dewrêş, Kêmal Burkay, Qanadê Kurdo, Casimê Celil û Ordixanê Celil dî nav pêşgotinên heft diwanên Seyda da, li ser wi, ji hev xweştir pîr tişt dengkirine. Her yekî meznaya Cigerxwin, hunermendiya wi, efrandin. Ji yin û şer û têkoşina

Cigerwin ji aliyê (tanga) xwe da, bî zareki xweş va vekolandine, baweriyên xwe gotine. Bî rasti dema mirov, van pêşotîna dig-hine hev, dîxwîne û wan dîde ber çavên xwe, mirov dibîne ku Cigerxwin ne tenê caneke, miroveke. Cigerxwin bî rasti defineke, dî efrandinên wi da tu dîkari pîr tîştan bîbîni, tu dîkari tîr bîbî, bîna te dîkare fireh bibe, klam-stranan tu dîkari guhdar bîkî, tu dîkari sero - bîno Kurdistanê bîgerî, derkevi seyranê, tebiyetê, mirovan hez bîkî, rê dîkeve ber te, du dîkari pîştî xwe rast bîkî û tu dîkari dest bavêji pêşîr - qîrîka dijîmî, bernedî...

Jî ber vê yekê, helbestên Cigerxwin tenê dî nav rûpelên pîrtukan da ne mane, ew bûne per - bask jî bo gelê me, bûne klam - stran û lî zarê bî milyonan kurd geriyane. Ne tenê kurd, kesekî lî ser pîrsa kurdan kê - hîndîk tîştan zane, bîvê - nevê navê Cigerxwin bihistiye. Navi wi bûye bawerîk, kubarîk û bûye nişaneke çand - hunermendiya gelê me.

Rola ronakbir - rewşenbir, zane, nivîskar û helbestvanan dî warê hîşyarbûn - serhîldana milleteki da pîr mezîne. Ew xwe dispêrne gel û pêşengiya gel dîkî. Ew rê vedîkî, rê didîne ber gel û ew xwe jî rê wiyên vê rêne. Ev kesana bî taybetî rîya xelasiyê, bî karê n xwe va lî ber gel datînin û dibîne neferê vê rê. Ew bîn firene, dengê wan xurte, ew dîkarî dîr bîbînin, ew tu wext xêra xwe naporêzî, serbîlîndiya xwe bî rûmeta serhîldana gel va dîkî yek û per - baskê wan germ - firehe, bî milyona kes dîkarî lî dora wan berev bî, pey wan bîmeşî. Dema em çavên xwe lî rewşa cihanê dîgerînin, rola wan kesan hî jî xweş jî me ra dîyar dîbe. Lî Sovyetê MAKSÎM GORKÎ, lî Şîliyê PAPLO NERUDA, lî Tîrkiyê NAZIM HÎKMET, lî Îspanya'yê FREDRÎCO LORKA, lî Felestî - nê MAHMÛD DERWÎŞ, lî

Yunanistanê YANNÎS RÎTSOS, lî Ermenistanê XAÇATUR ABOVYAN, lî Bulgaristanê VASÎL LEVSKÎ û lî Kurdistanê CIGERXWIN...

Mamosteyê mezin Cigerxwin hertîm, dî nav karê n xwe da pîr tîştîne berbiçav pêk anîye;

- Cara pêşîn Cigerxwin tu wext tevgerên gelê n bîndest, şerê karkeran û pîrsa internasyonalîzmê jî hev nedaye çetandî. Xêra van hersê xebatan bî hevra girêdaye û tu cudatî navbera wan da nedîtiye.

- Seyda, jî bo hîşyarbûn, xelasi û azadiya gelê kurd, bî hîşki - xurtî rawestaye. Welatparêziyî dî jîyî û dî karê n wi da ciheki fireh grîtiye.

- Dî warê çand, hunermendî û edebiyata kurdan da wi valahîke mezin tîjî kîriye û xêra wi pîr gîhîştîye van karan.

- Jî bo pêştabîrîna zîmanê kurdi nivîsandî, xwendî û hînkîrîna zîmî, Cigerxwin tesîrêke mezin lî ser xwendevanên kurd hîştîye. Pîrtûkên Cigerxwin lî Kurdistanê lî ser destan geriyane, bî dîzîka va, bî kêfxweşî û şabûneke mezin va hatîne xwendî. Pîr xortên nûgîhîştî û nîfşa teze pey efrandin û dîwanên wi ketîne, Cigerxwin jî dîr va bûye mamoste, ew jî bûne şagîrt.

Seydayê mezin Cigerxwin, dî sala 1903' an da lî bajarê Mêrdînê hate dînyayê û wi isal pêra 80 salîya xwe tîjî kîr. Dî nav van salên dîr - dîrêj da, mamoste Cigerxwin lî Kurdistanê bî rasti bûye mamosteyê bî milyonan kes û milyona kes pîrtûkên wi xwendîne, nasiya xwe dane bedewiya hunermendiya wi. Jî Kurdîstana Tîrkiyê bîgre, heta Kurdîstana Suriye, jî Îranê bîgre heta Kurdîstana Iraqê lî hemû Kurdistanê Cigerxwin per - bask vekîriye jî hemû welatparêzên Kurdistanê ra. Bo vê yekê jî navê wi bûye nişana welatparêzî, mirovhezî û bûye nişana azadiyê. Bî bawerîya me, meznaya Cigerxwin jî vir tî û ev yek çav-

kanîke. Cigerxwin nêzkaya 1500 rûpelî helbest nivîsiyê dî nav 7 dîwanên xwe da. Ev jî bo çand, sînet û hunermendiya kurdan defîneke, sertaceke. Wi ser niştîmanperweriyê nivîsiye, lî ser xêra karkeran - rencberan, lî ser internasyonalîzmê, mirovhezî nivîsiye, lî ser evîntî, lî ser dîlketîyan nivîsiye û dîlketîyên destê wan tu wext ne gîhîştîye hev. Bî kurtîbîrî Cigerxwin tîr - tîjî, bî adan nivîsiye û xweş nivîsiye...

Nîha karê nivîskar, zane û ronakbîrên kurd jî ewe ku efrandinên Cigerxwin vekolînin, jî hev derînin, wan bî sistematîk bîxwin, bînyata wan veçêrin, jî ber wan tîştên nû fêr bîbî û meznaya Cigerxwin lî hemû cihanê bîdî nas kîrî, ev kar jî lî pêşîya me sekîniye...

Hemû ev karana jî nişani me didî ku, Cigerxwin lî seranserî Kurdistanê him - bîgehên pîr tîştan xurt kîriye, an jî nû va avîtiye. Jî bo kurdan navê Cigerxwin hêjayî xelata here mezîne. Vê xelatê gelê kurd wê bî xwe bîdê. Dî nav vê rêwîtiya 80' ê salî da, Cigerxwin xwe dîkare dîlşa û kêfxweş bîhesîbine.

De werî em 80 salîya helbestvanê mezin pîroz bîkî, jê ra xweşî, rojên çenc û bineke firetî bîxwazî, de werî em wi careke dî pîroz bîkî !..



# CEJNÊKI ERXEWANI

M.S.K

Pelehewrekan le kalbûnewe da bûn, berebere rûy geşî asimane şîneke derdekewt, dû kursiyan leber berçokey hewşekeyan da dana bû, dû hawrêkey diyan hêsta le jûrwe rakışawn. Eme sali sêyem e herçwaryan pêkewe lem xanuwe da dejin. Sibeynê "ARIFE" ye. Balefire debîn û deçinewe bo şarekey xoyan "ŞÊRO" be temen le hemûyan lawtr bû. Şeri beriz kirdewe w zerdexeneyek kewte ser lêwi. "RIŞTÎ" be tilayi çaw hesti bew zerdexeneye kird. Bê ewey xoy lêl bîka çawî buriyewe dêrekani kitêbekey berdesti, deyzani hawrêkey zor dili bem sefere xoşe lêyi nagirê. Taze zawa ye w xêri le bûkêş nediwe lêm rûne sibeynê beyani zû, lexew heldestê teraşekey dekat û çayi man bo lédenê. Ewca yeke - yeke betaniyekanîman le ser ladeba w delê:  
— Kure selamet bin, besi niye nustîn. Seretay sefer qisey xoş û pêkenin razi dil û tasey dûriy xemrewênî rêgayî dîr bûn. Belam ta dehat û tekan û şî-

kayi an dehat. Taway lê hat bédengi bali besera keşan "HAWAR" bedem henaseyeki çûlewe witi:

— Tuxwa em sefereman pêwist bû.

"ŞÊRO" begirjiyekewe witi:

— Bê belabîn, bo cejniş bo biroynewe

— Kaki bîra, cejni çi? Ke dil xoş nebu cejn çi sûdêki heye? "EWLA" ke ta êsta bédeng bû witi:

— Tenga meger wek ewaney le bêxewida pena debene ber mey êmeş bo demarsîr kirdîn biroynewe dena...

"RIŞDÎ" witi:

— Dena bo pilaw û qeyî cejn naroynewe "cejnê cejnane" her şîn û xem bê...

Pêş ewey niwedêrekey di bilê "ŞÊRO" wek biyewê babeti qışekan bigorê w bîzanê axo xeme gewrekani "EWLA" netîwanetewe bedem miji cigerekeyewe lêy pîrsi:

— Kakewla, debê ta êsta meseley mindalekan it belayek da nekwetibê w careki bo dozrabetewe.

— Waz lew base bîhêne! mesele, leçardozinewe da nemawe "EWLA" govarekey desti dana w cigereyeki

dagîrsand. Legel giri çerxekey da bi-reweriyekani wîrujan û kewtine palepesto legel yektîr da, "çî" pîrsyare bo "ŞÊRO" kirdi? Kê be birya dehat encami ew xoşewistigeman wehay lê bê? Ew rojey "Fîraz" im guwastewe wam zani itir hemû cihan hi min e, beasûdeyi serim existe ser singî w razay xoşewisti' im bebiroske be dili eda, kotayi eşkence w azar im hat. Katê mînalîş kewte nêwanîmanewe birim leweş kirdewe. Kelaweyekyan bo pêkbîhênim. Şewnîxunim kirdê haweli xoşewistim, rencim be bar le ser şani xom tand kird emwist cihane dijwarekey caranîm le yad bîsirmewe, wek bendê bawêş bo tişki xori gum bû bîkatewe dinyayeki nuwê le amêz bîgrîm, lanem tewaw kird. Palîm lê dayewe, "SERINC" i kîçîm gelêcar serincimî bo lay xaniwekem radekeşa ke deywt, (babe gyan, em xanîwe hi xomane itir naguwezinewe) mîniş maçîm dekird û pêm degîwt, (bêguman hixomane, itir hetahetaye têtîda dejin) xoştrîn satî jyanîm ew kate bû. Le îşekem debû-

mewe w deçûmewe nawiyan ... ta ew rojey sefere sextekem hate ber. Bo ewey le xeribayeti be tenya nehêlûm bawki "FIRAZ" i jînûn û dayikim hênaye mali xoman. Ewca be dînya-yewe becêmhêştin. Dîway salêk Azari tal û suwêri geramewe. Hemdi - hemdi çend rojê ténaperê hêşt birinekani leşim sarej nebûbûn. Xezûri muhteremim pêy lê kirdime kewş, xniweke becê bihelim. Çünke xaniwi xoyeti, eyi cenabim bêş seferekem le tîrsi rojgar û bewitêkani ew riş spîye dinyadideye helnexeletam û neçûm xaniwexem le ser tapo kird ? De bixoyewe beşit bê ! meselem geyande dadîga, belam bê sîd bû, ew bedbexte her beweşewe newesta jinekeşmi lêhandam. Lebatî piştîm bigrê w em narewayîye qbûl nekat ewiş piştî têkirdim. Ta benaçari destim lewiş helgirt, minalişim lêzewit kîra, be çawniqandîne. Ne xaniw, ne jin, ne minal le hemûyan bêberi kîram. Ew çîraw mînaley bedilmewe enivsandin êsta dîwrin lêm, to bilêy imro bîyanbînim, eyi eger le ber dili ewan hebê mîn bo cejn dêmewe ? Xozge imro daykim hênabêtînye lay xoy'.

"Aewla... legel ew birewerye talane da eja. "HAWAR" iş şani nabiwe ser biştyekey nêwanyan û kewtibû deryay lêkdanewewe şriti kilometri otomobileke wek mar dekiş. Rêgaş depêçrayewe. "RİŞDÎ" le awêneke da seyri "HAWAR" i dekird ke zor mat û bêdeng bû ley pîrsi:

— HAWAR, xwuşke zakanit bo cejn le mali lêwe ebin yan le mali xoyan ?  
— Rastyekey, mîniş bir le we dekeme we çünke eger pêkewe nebin bo mîn debête girûgriftêki gewre.

"Girûgrifte ke le yekem engawtîne- we destî pêkird û kotayî nayet, ew engawtîney mergî kird be mîwani ew hawrê xoşewistem. Mergêki cerigbir. Êstaş wa ezanîm duwênêye ke be cûte damane hewraz û kale w pitawî seferêki dîrman pêça, belam duway salêk be tenya geramewe cige le yadgarêkani hiçî tîrim pê nebû bo mînalekani. Herçend çawim pêyan dekewê bedyar wênekey bawîyanewe ebleq ebin kîspe le cergim heldesê w hiç çarîşim niye. Êstaş mîn nek her xalyanîm, belkû le cêy bawkişyanîm. Çünke nek her zawan bû belkû hawrêy dêrinîm bû, le katêk da xuwên le ser singiyewe fuwarey dekird., serim xîstîbuwe serranîm û awîm detîkande geruyewe dwawîşey ewe bû (Hawar nehêli, mînalekan bêbawkiyan pêwe diyari bîda), belam axo twanîbêtîm ew erke pîroze be cê bihênîm". "ŞÊRO" destî be dugmey radyoke- we bû, degera şîte bîdozêtewe. Haw-

rêkani pêbîhênêtewe naw dinyay otomobileke, le ser êzgeyek raygirt. dengê hat be guwêyana "le gare we, le şox û şengi pare we" pêş ewey dwanekey dwawe bêne qase "RİŞDÎ" be pêkenînewe wîti: em goranye bo kak Şêro ye ! "ŞÊRO" henaseyeki sardi helkêşa w serêki raweşand wek bilê: "Rast e bo mîn û hawtemeni mîn e, belam feramoşim nada" mijeki le cigereki da w melî xeyalî bo lay şoxekey fîri, "Nazenin" e key wek fîrişte hate berçawî.

"Seretay yektîr nasinman zor seyri bû. Leweş seyrtîr xoşewistîye kurupîrekeman bû. Xwazbênîm kird le we da bûm bigwêzmewe. Karesatêki cerigbir xêzani desgiranîmî respoş kird. Bîrayeki taçaney hebû, hewalî kuştîni geyşt herçend çawim be renge jakawekey nazenin dekewit, demarîm kîrij debû, xom pênegîra şuwên-pêy bîra cwane mergekeyim helgirt û royştîm. Seferekey mîniş dirêjey xayand. Şew û roj wênexîm le ber çaw bû. Xoşewistîm ta dehat ziyatîr bilêsey desend. Katê geramewe. Çendeha awatîm xînkênra. Tenya truskayîyekîm mabû, ewiş nazenin bû, derwazey baxî bextyarîm bo kîrayewe, belam peş ewey gulebaxekem bon bikem pasewanekan kîrdmîyanederê w le biyabanêki dîr fîreyandam, wa bo sê sal deçe çend mangê carê çawim pêy dekewê, hercareş beser kospekda deçîmewe, heng le gulebax dabîrin bacêki giran e, belam ewiş be ser deçê..."

"Rîşdi" lew katewe "Şêro" henasekey helkêşa çawî birîbuwe rega dûreke w destî bestrênekewe bû, belam hoş û hestî le şuwênê bû zor le rêga- ke dîrtîr.

"Ebê hali bawkim le çîda bê ?  
Çon pêşwazî em cejne bikat ?"

Le hemû daragi dunya da dû kîri heyê, belam nayete birî cejnêki pêkewe legela kîrdîbîn, her cejne yekeyekan dîyar nabîn, belam em cejneyan zor sîtem e, wa mîn herçonê bê milî rêgam gîrtîwe, belam ew çon ? Le şuwênêke be hiç core tuwanay hatînewey niye, mînalekani çawyan birîwete rêga, belam bê sîd e, mîn

ezanîm encamî sexit yan hewaneweyê yan eşkence w azar. Ême le beşî duwem bîdwêyn, zuxawêki nuwêman dîway zuxawe koneke noşî, zame kanîman hatewe suwê hawkîm be tenya bû, hemû xemey kelekey le ser singî kîrdîwe, xoy dexwatewe w nahelê wrdilekan be zamî dilî bîzanîm, em êwareye degemewe lay, dîlxoşî dedemewe, mînalîm yek yek maç ekem, bîçkolekeyan dekeme baweş, hewil edem xom rabîgrîm û dilîm pîr nebê, eger zorîşîm bo hat fîrmêskanîm le naw qîje xawekeya deşarîmewe, ke lêm pîrsê:

— Mame ! Kuwa babe ! bo legel ta nehatewe ?

Pêy delêm - dil nîyabe ke bemzwane dêtewe ! Debê grî derûn û fîrmêskî şarawey çawekanîm û wişê xînkawakani gerûm bikem be zerdexene w be ser lêwe helbîzîrkawekanîyanî dabeşkem"

— Rîşdi, agat lexot bê.

Qîrişkey hawrêkani hênayewe hoş xêy ke seyri enlawlay cadekey kîrd bîni ew nawe tenîrawe. Otomobileki zor laydawe w xelkekeş hawarhawaryane, emîş kete larê w otomobilekey westand, ke dabazîn be ser dîmenêk da hatîm ke hergîz le bir naçêtewe. Çend lawêk le temenî gulale sîrey Kurdistana le naw qefezêki sutaw da helseqîrcên herçîjekîyan kîrd bo rîzgarkîrdmîyan bêşûrd bû. Katê wîstîra bîyanben bo nexoşxane, herçuwariyan çawyan birye yektîr, be çaw le yek geyştîm, ew birey be mêşkiyanî dehat yek serçawey hebû, ketîne kokîrdînewe w derhenanî laşey cuwanemerge sutawekan. Le kwêwe hatîbûn le gel termekana berew ewê geranewe, duway çend kilometrê royîştîm "Hawar" wîti:

— Em lawanêş neyanewîst wayan be ser bê, hezareha awatî sewz le dîlyana bû. Hazyanbewe dekîrd cejn le gel dayîk û bawîk û kes û karyan bîken. Ewla w sêro fîrmesîk le çawîyan qetîs mabû.

"Warêmeş em cejne erxewanyeman newîst. Rîşdi emey wî û ziyatîr pêy be benzîna na ta le otomobilekan dîr nekewêtewe ke hemûyan berew şare dûreke dekîsan.


Em çîroke le Kovarî " Rojî Kurdistan " (Jimarey taybetî-1980) wergîrawe

XWENDEWARÎ XOŞEWÎST

BERBANG GOVARÊKÎ KULTURÎ  
W KOMELAYETÎ KURDÎYE..

— PÊŞNYARÎ BO BIKE..!  
— REXNEY LÊ BIGRE..!  
— BILAWÎ BIKEREW..!





# Komela Tiyatroya Kurdi

HAT  
SAZKIRIN



LI BAJARÊ STOCKHOLMÊ, JI ALIYÊ ÇEND LİSTIKVANAN VE KOMEKE TIYATROYÊ HAT PÊK ANIN. NAVÊ VÊ GURÛBÊ DANINE "KOMELAYA TIYATROYA KURDI LI DERWEYI WELAT". JI BO RÊVABIRINÊ KARÊN KOMA VÊ TIYATROYÊ, LİSTIKVANAN DI NAV XWE DE DESTUREK JI AMADEKIRINE. DI VÊ DESTÛRÊ DA, DI XALA BI NAVÊ "KAR Û BARÊN WÊ" HATIYE NIVİSANDIN KU; "NASAN-DINA EDEB, FOLKLORA KURDI, BI PROBLEMÊN POLİTİK, CIVAKI, ABORI JI KURDISTAN. BI GELÊ KURD Û GELÊN DIN DIDE NASANDIN". DI MERCÊN ÊN-DAMETIYÊ DA JI TÊ GOTIN KU; "LI SER TIYATROYÊ BI KÊMANI ZANİNEKE Wİ HEBE". DI DESTURÊ DA JI XWEŞ DİYAR DIBE, KU EV KOM, JI BO PÊŞTABIRINA TIYATROYA KURDI WÊ KAR BIKE. BELAVOKA KOMELA TIYATROYÊ LI JÊR Ê

Be amade boni hawrêyan le hunermend û hunerdostan û xawen tuwanay huneri le seranserî Kurdistan da "Eraq, Eran, Turkiya, Sûriya" twanira le cewêki dimokratî w huneri w birayeti w hest kirdin be xizmet guzari milletekeman tipêki şano y kurdi da bimezrênirêt be hiway berewpêş xistini huneri şano y kurdi le derewey wilat.

Tipeki şano ke rewîştî ciwan û bir w tawanay huneri tya kobikîrêtewe le pênavî xizmet kirdini gele hejarekeman be şeweyek ke bitwanin be baştrîn şewe perde le ser waqiyeti faşisti w dirindeyi w na dimokratî dujmanan heldeynewe w dji imperialism û zayonizim xebati

huneri man twnd û behêz keyn.

Hawrêyan !

We nebêt em tipe be yek car hewil û koşîş hatibête berhem belkû bepêçewanewe te ber bûni komelê helwêsti naqola w na beçê w bûni xoperisti hendê kes û hendê layen ne etwanira em kare piroze bête encam. Belam ewey gumani tya niya w şayani base ewe ye ke hêzi gel û twanay cemahir nebiraweye w le bin nehatwe w pêşel kirdin û lenawbirdini karêke neşiya we.

Mebesti sereki ême witnewe w pêşandani waqiyeti Kurdistan e we. Herweha hawbeşi kirdinmane legee hêz û rêkxirawe huneriye pêşkewtûxwazekani ge-

lani cihan be pêşrewayeti gelani çewsawe w zorlêkiraw... be mebesti wedesthênani baştrîn yarmeti w hawkari bo geli kurd.

Hawrêyan !

Eme bîrwaman be hêzi nebirawî cemawer e. Eme bîrwaman wa ye ke komelê hunermend û hunerdost û twanay huneri şarawe he ye le cemawer da tenha be xo nîzik kirdnewe w harikari ewan etwanin xizmeti gel bikeyn be baştrîn şewe em tipe bikeyne yekemin hengawî bo wedesthênani baştrîn huneri şano y resen le derewey wilat.

KOMİTEY DAMEZRANDINI  
TİPİ ŞANOY KURDI - LE  
DERWEY WILAT - "SIWÎD"



# MA EV QEDERA MIN E?

SIYABEND

Seyranê taştiya mêrê xwe biribû ba paleyiyê û li serê xwe da bi kêf hinek tişt digotin û ber bi malê dimeşiya haya wê jê çê nemabû, li binê guherê nihêrt, siwerek sekiniye. Dema Seyranê ew dît nav û dilê wê lerizî û tevziyek bi çokên wê ve hatin, ji bo ku ewê siwar baş naz dikir.

Seyranê bûka salê ye mînaye tirheke hinarê nû - gihayi panzdeh salên xwe qedandiye, an na. Dema keç bû dîsa siwar çî bû, çawa bû, nazdikir û çend caran bi zor xwe ji lepên wî xilas kiribû. Axayê 'eşîra Wan e, emrê wî dora çil sali ye û deng li Seyranê

kir û got: "Seyrê heya ez peyabim û hespê xwe girêdim gerek ti bi hemî tiştên xwe pêkhatîbî û tu zanî!, lê tu ne hazirbî ez ê bi vê demançê mêrê te bikujim û tê ji min ra bimînî!"

Seyranê dîl ma û mîna çivîka ku dikeve nav pencê Başokê bêçare ma, çendî pirpitî hilpekiya jî lê ji destê Axê ne filitî û daxwaza Axê bi cî hat.

Seyrana reben mîna pezeke nîvgurxwari melûl melûl li rîya malê meşiya. Kesên wê dibînin mîna tifi nav çavên wê bikin. Naxwaze li kesî binhêre û bi kesî ra xeberde. Bi mehan mîna kabû-

sekî ji ser Seyranê xwe dûr nekir. Mina ku gulek bê av bimîne, wusa li Seyranê hat. Lê Axa Seyranê ji çav nake û li fetlekê digere, ka wê çawa Seyranê bidestxe.

Payiz li wan hat û cardin dest bi cot kirin. Axê hinek'erd ji destên wan derani û da bavikekî din, lê xwe eşkere nekir tenê di bin da ew bera bavikê mala mêrê Seyranê dan û neyarti ket nava herdu bavikan çend caran şer kirin lê Axa bi eşkereyi hevaltiya bavike din kir. Dêrê Axê ew e ku di şerda derbeki li mêrê Seyranê bixe û ew jê ra bimîne. Hinek ji pismamên Axê ji hevaltiya mala bavê mêrê Seyranê di-

kirin. Birayekî Seyranê heye û zavê mala Axê ye. Ew carna ali Axê ye û carna jî zilmê qebûl nake li navberê dimîne. Seyranê bi caran ji mêrê xwe re digot: "Haya te ji te hebe ev Axayê zalim ji te hiznake û wê di şer da derbeki li texe. Xetoyê belengaz ji ne ewî kuşt ka kî çi jê ra got. Hukumat jî hevalê bēnamûsan e".

Cardin bû şer û bera din tevî Axê dane ser vê berê û ev belengazan revîn ta ketin gund û ew ên din ji derveyî gund in gazî van dikin gotina ji wan ra dibêjin. Lê ev jî li ber xwe didin, bi keviran davêjin hev. Axê got herne wan û dest bavêjin namûsên wan. Xwişkaka min û Seyranê bînin ji min ra ez ê xwişkaka xwe ji wan bistînim û bidim filankes ku ji wî ra gotiye tu derbeki li mêrê Seyranê bixî û xwişkaka wî ji jinbira Seyranê ye.

Birayê Seyranê ta hingê li şerê wan seyr fikir û dema ev gotin seh kir hilqevast û ji destê yekî tîfing girt û gazî Axê kir û çok da 'erdê, derbek avê Axê, qîrîn ji Axê çû û ling kutan lê ji wan ên din ra çê deng nekir û da rê çû qereqolê teslim bû. Lê Axê li wir can neda birin Diyarbekir, çend rojan ma. Îfadê xwe da. Di îfadan da mêrê Seyranê, birê wê tiyê wê, û hinek din diçin pêşiya wî riya wî dibirin û bi hev ra davêjine, tev sûcdarkirin û ew jî mir.

Piştî Axa mir ji rexê bira û apên wî mala bavê mêrê Seyranê talan kirin ecêb anîn serên wan.

Birayê Seyranê kete girtîgehê, lê mêrê wê reviya û li derve ma. Mana wî pir bi kêrî wan hat, ji tîrsa wî û çend kesên pê re li derve ne, mala Axê zêde ezyet li vanên li gund in nedikirin. Lê bi hikumatê ezyeteke ecêb di anîne serên wan û heroj mefreze davêje ser gund, cendirme dikevin nav erz û eyala wan. Başçawûşek hate qezê ji mala Axê tilî digirt ewî dema davête ser gund tiştên nemayî dikirin. Piştî çend carên

avête ser gund, ewî jî çav berda Seyranê. Rojekê cardin davêje ser gund û Seyranê tenê li maldaye ji Seyranê pirs dike dibêje, "ka mêrê te ?" Seyranê çend gotinan bi tirkî di zanibû dibêje: "ez nizanîm" û ev lê tê xezebê hinek xwe lê diqîrîne, lê paşî bi xweşî diçiyê û dibêje: "ez ê ali we bikim. Bira were teslim bibe û wê zû ji hundir derkeve. Ewqas ti delal î meriv çawa alîkariya te nake". Du cendirme daniye devê derî, ew û Seyranê mane li hundir. Seyranê tu mecal nedît ji destê vî bê oli bi filite.

Çend caren din jî avête ser gund û bi Seyranê re tenê ma. Seyranê li çokên xwe dide, destên xwe vedike berbi jor ra dibêje: "Rebiyo ma ev çêdera min e; ano min Leglega reş kuştiye; ez xwe bikujim; ez terkeseî dinyayê bibim; ez a sitû xwar nizanîm çi bikim ?" Ponijî û rê jî rê der-naxe. Dê ji mêrê xwe re çawa bibêje, kes ê jêre karibe bibêje, ewê tenê birayê xwe yê li hepsê bi-jart. Ji bavêkî ew û birayê xwe tenê hebûn û diya wan û bavên wan ji zû va ew tenê hiştibûn û mîna ji bavê hezbike, wa ji birayê xwe hezdikir.

Dema çûne dîtina girtiya ji birayê xwe re mesele ji serî ta dawî got û mesela Axê jî got û gote birayê xwe "ez çi bikim ? Ji min ra bibêje. Ez xwe daleqînim, ez xwe bavêjime avêkê bi xeniqînim; lê ez terkeseî dinê bibim; ka ez çi bikim ? Ji min ra bibêje" û mîna tavîyên barana nîsanê hêstir ji çavên wê dibarin û destê birayê xwe maçî dike û dibêje: "ez qurbana birayê xwe me. Ez bûme sebaba te dinya te teng buye, mirin ji min ra ji mayîne pir çêtir e".

Birayê wê destê xwe da ber ruwê xwe û ponijî, serê xwe xist ber xwe û li 'erdê kûr kûr nihêrî. Dawî bi rengekî xweş got. "Seyran, xwûça min here malê çend rojan li benda xeberekê ji min re bimîne tê li wê gorê birê-

kevî. Belkî bextê me reş e, diya me mir bavê me hat kuştin ez hinek mezin bûm lê ti piçuk bûyî, li berdest mayî, mîna dila û niha jî ev tişt hate serê me, ez bi herdu dest û piyên xwe girêdayî me. Ez ê çi bikim ? Delala birayê xwe, here û li benda min be".

Seyranê bi dilekî nivxweşî bi hevalên xwe re dageriyan malê û ji gotina birayê xwe hinek germî girt û nedizaniya ka wê birayê wê çi xeberê jê ra bişîne û mitala xebera birayê xwe kir.

Roja sisiyan bû. Xebera birayê wê hat, ku ji hepsê reviyaye û li hemî cihan lê digerin û hatine gundê wan jî, lê ew bēnamûs nêzî mala Seyranê nebû û pîrsa birayê wê ji gund kirin û gundî li bēndere civandin û ji wan ra gotin: "Hûn mahkumê xwe di demeke nêz da teslimî me nekin, em ê gundê we bişewitînin, de hûn zannin".

Dema birê Seyranê di hepsê da bû, pismamekî jina wî jê ra namemek şandibû û gotibu: "de tu li hepse lingan dirêjke û ez jî her şev li gel domama xwe dirêj dibim". Ewî jî, ji wî bawer kiribû boy ku ewî birayê jina xwe kuştibû. Her çendî li jina xwe bawer û qayil bû jî cardin ji xwe ra digot: "ew ê çawa ji min ra durust bimîne, ez qesasê birê wê me" Cardin jî ji xwe ra digot: "ewa ez nazdikim, ew bi min ra xayintî nake û ew ê tu caran ji birayê xwe heznedikir û diya wan ji ne yek bû".

Deh roj derbas bûn. Birayê Seyranê ji hepsê reviyê û deng jê tune. Roja yanzdehan gotina kuştina pismamê jina wî mîna dengê ewran belav bû.

Çend rojên din çûn, ew Başçawûşê bēnamûs jî di mala xwe da hate kuştin, bi destê birayê Seyranê.

Çend şahidên kuştina Axê hebûn û gotibûn: "Dema ev kes hatine pêşiya Axê, me ew dîne".

# DEWLET

## PLATON Û ILIM

*Cihangir Sero*

Dî vê nivisarê da, em ê lî ser Filosofê mezîn Platon û dîtînen wi lî ser dewletê bînvîsînî. Hûn dîkarîm bîpîrsîn û bêjîm, çîma Platon ? û çîma dewlet û ilim ? Bersîva van sîalan rehet nîne û mîrov nîkare bersîveki rînd dî nîvsareki kurt da bîde. Lê disa jî mîrov dîkare bîbêje ku pêkanîna teoriya kulturê pêwîst e jî dîroka ilim, îdeoloji û zanîbûna civatên kevn destpêbîke. Jîyana entellektuelî û kulturî jî kevnar da heye û bî gelek şeklên curecur heta îro hatiye. Pêwîste, hemû Kurdên ku bî xebata entellektuelî meşgul dîbîm, ilim, kultur û îdeolojiya civatên kevnar jî fêr bîbîm. Ew sebebekî ku em vê nivisarê dînvîsînî. Sebebê duyemî jî eve; nîvisarên lî ser Felsefe, kultur, dîrok û hwd. bî zîmanê Kurdi nehatîne nîvisandî. Nîvisandî lî ser wan tîştan wê bî xwe re, bî zîmanê Kurdi peyvên îlmî û terminolojiya nîvisandîne pêşxîne. Ew jî xebatekî grîng e. Sebebê sîsîyan jî, danûstandînen civatê û ilim bî hev ra çî bûne û dîkarîm çî bîbe. Dî xebatên îlmê modern da gelek mînaqêşe lî ser rola civat û ilim, ilim û îdeoloji, îdeoloji û civat dibe. Ew mînaqêşe jî pêwîste Kurd bala xwe bîdîne.

Dîroka ilim û pêşketîna fîkrên îlmî dî civatekî koledar da û her wuha jî dî civatekî kapitalîst da jî gelek enteresant e. Civata Yûnan a antik, civatekî koledar bû, lê belê, jî aliyekî jî da, vê civatê filosof, îlmzane û nîviskarên mezîn û granbuha pêkanî. Vê nakokiyê mîrov çawa dîkare xwuyadan bîke ? Lî aliyekî, civata koledar, lî aliyekî dî jî îlmê pêşketî, kulturekî fîreh.

Wekî ku tê zanîn, jî bo mîrov bîkarîbe bî xebata îlmî û kulturî meşgul bîbe, pêwîst e dî civatê da "keda zêde" hebe. Bî keda zêde dî civatê da û pêkhatîna tebeqêkê sosyal, îmkân jî bo xebata îlmî û kulturî pêkte. Jî ber vê yekê, sebebî yekemî ku rê lî pêşketîna ilim û kultur vekîr, erzanbûna keda însan (pîrbûna kolan) û keda zêde bû. Bî vî awayî, mîrov dîkare bîbêje; ku danustandînek gelek xurt dî navbêna tipê civatê û xebata îlmî û kulturî da heye. Tipê civatê û xebata îlmî û kulturî dî nav danustandînekî diyalektîk dane û ev danustandî jî tipê entellektuel pêktîne. Bî jîyana xwe, bî dîtin û îdeolojiya xwe va entellektuel jî civatê tîn û tesîr lî civatê dîkî. Danustandîna dî navbena civatê û entellektuelan da, jî aliyê dîroki va, gelek şeklên curbîcîr ruyê me dîde. Em nuha jî vegerîm ser Platon û dîtînen wi lî ser dewletê.

### DEWLETA PLATONİK

Platon lî Atîna hate cîhane. Berî Miladê (B.M) dî salê (427 - 347) jîya û jî malbatek xanedan dîhat. Mercên Platon ê maddî û malbata xanedan tesîr lî ser fîkrên wi yê civakî û îlmî dîkîr. Nîviskariya Platon gelek fîreh û dî nav de bîyoloji, matematîk, felsefe û sîyaset heye. Lê emê dî vê nivisarê da bes lî ser dîtînen Platon yê lî ser dewletê bîsekîmî. Ev dîtin xwedî fonksiyonekî dîroki ne, wek dewlet, çîn, tebeqên sosyal û hwd.

Xebata Platon lî ser dewletê, dî pîr-

tûkê "dîyaloga" da formule dibe. Dî van pîrtukan da mamostê Platon Sokrates, jî Platon dîxwaze ku ev dîtînen xwe zelal bîke û peyvên xwe runbîke. Jî bo dewleta platonîk ev peyv û gotînen orîjînal in. Û bes jî bo vê dewletê derbas dibe. Dewleta platonîk ne dewletekî ku heye, lê belê dewletekî ku dîkare pêkbê. Jî ber ku ew dewleta pêknahîye; pêwîst e Platon, dîtînen xwe lî ser dewleta îdeal zelal bîke. Sebebê "dîyalogan" jî ew e. Jî bo xebata xwe hêsantîr bîke, Platon jî "welatîyekî baş" dest bî xebatê dîke. Ev hemwelatî lî gor dewleta îdeal e. Karaktera vî hemwelatîyî jî ev e; zanîbûn, merxasî, bîpîvanbûn û bîadaletbûn. Ev wesfana pêwîst e, lî cem dewletekî rînd û îdeal jî hebîm. Profesore felsefê Gunnar Aspelin dîbêje ku, "Dewlet bî serokê xweva zana ye, bî şervanên xwe va merxas e, bî pîvanbûn jî ew e; tebeqê jêrdest, wekî tucîr û zenetkarî, cîhê wan dîvêt dîbîm destê filozofan de be [r. 19". (1-2)] Lî cem dewleta îdeal hîn wasfêkî kê mî, ew jî bîadaletbûn û rasti ye. Bîadaletbûn û rasti lî cem dewleta îdeal mîrov dîvêt van tîştên jêrîm fambîke: dî civatê de hemû mîrov cîhê xwe nasdîkî û jê memnûnî. Mêr, jîm, kole, tucîr, zenetkar û hwd. Wesîfên xwe dîzanî û karê xwe jî hev nayînin. Lî vîr pêwîst e me îşaret bî tîştêkî grîng bîkî. Dewleta platonîk ne dewletekî ku mîrov nasdîke, wekî dewletên cîhanê yê îro, bajarên mezîn, xelkekî pîr, mîntîqa fîreh û hwd. Dewleta îdeal bajardewlete, angî jî alîye cografî da bîçûk e. Dewletekî

pır teng e û mirovên vê dewletê bî gış-ti hevdu dınasin.

Dewleta platonik, dewleteki çinayetiye û dî civatê da rola çin û tebeqên sosyal mezın e. Dî seranserê civatê da filosof, dî du filosofên ra leşker dawiya hiyerarşiya dewletê da tucar û zenetkar (xwedi - sermaye) hene. Kole û jin lî dervayi dewleta platonik diminin. Platon dıgot ku, "Kole bê qıymet in û wesifa wan bes xebata giyani ye". Jı bo wan ditına, Platon û demokrasiya Atina lî hev ne dıkir. Mırov ditnên Platon baş analiz bıke; ewê sebebe dijayetiya wê bî civata Atina ra derkeve holê. Bı kurti Platon lî dıji demokrasiyê bû.

#### DEMOKRASÎ MIROVA PÛÇ DIKE

Dî dewleta platonik da ferqiya mezın dî navbêna hemwelati û ne - hemwelatiyan de derbasdibû. Hemwelati, xwediye hemû heqan bûn, jiyana wan baş bû, qıymeta van zêde, dî civatê da rola wan hebû, mirovan lî wan godari dıkir. Lê belê ne - hemwelati ji tu heqên wan tune bûn. Demokrasi weki şeklê dewletê, Platon rast û baş nedidit. Jı ber vê yekê lî dıji demokrasiya Atina radiwesta. Dıgot, demokrasi mırov pûç dike. Sebebeki heri mezın ku Platon lî dıji demokrasiyê radiwesta, prensibê dengdanê bû. Bı mekanizma demokrasiyê va, diktatoriya pıraniyê, ango nezanan pêkdıhat. Ewana ji ne lî gora menfeetên dewletê bûn. Platon vê minaka jêrin dıde; Ku pıranıya hemwelatiyan jı dewletê şer bıxwazın, pêwist e dewlet şer bıke, yan jı pıranı şer naxwaze, pêwist e dewlet şer neke. Ango meslehên dewletê bı pıranıya hemwelatiyan û daxwaziya wan ve tê grêdan. Ew ji ne baş e. Jı bo vê yekê, Platon dıgot; ku prensibê azadiya axaftinê bı zerar e, jı ber ku her tışt dıkare pek bê, an jı pêk ne. Netica vê rewşê dıbe tofan û qıyamet.

Peyva dewletê û azadiyê û naveroka wan ku Platon dıparêze, weki Gunnar Aspelin dibêje: "Bı hemû awayi û bı naveroka xwe va aristokrat e (r. 19)". Platon baş dızanibû ku dewleta ideal lî seranserê cihane nıkare pêk be.

#### DEWLETA LI EZMANA ?

Peyv û naveroka dewleta ideal bı awayeki pırali bı teoriya Platon lî ser zanebûn û problemên pêşketına zane-

bûnê ve gıredayi ye. Teoriya zanebûn û cihana fıkr lî cem Platon, idealizm e. Cihana maddi û cihana fıkr jı hev cihê ne. Platon vê cihêbûnê dî felsefa xwe da gelek idealize dıke. Jı ber vê yekê, dewleta platonik lî seranserê cihanê tune ye. Dıvê ku ew dewleta lî ezmana hebe, Platon jı carna lî wan deran e ! Lê disa jı piçek realisti bı Platon re hebû. Dewleta ku lî vê cihanê pêkbıhata ne "dewleta heri baş" bû, lê belê dıkaribû "baştirê hemûyan be". Hemû dewletên ku lî cihanê hebûn û pêkhatın, xwedi kêmani bûn. Platon çar tipên dewletê nasdıkır. 1) TİMOKRATÎ: Dı vê dewletê da tebeqa bûn. Civat, jıyan, danûstandınên sosyal, hemû militarize bıbûn. Timokrati bı başi lî Sparta' yê organize bıbû. 2) OLÎGARŞÎ: Dı vê tipê dewletê da, tebeqa hındık û dewlemend, hakimi civatê û jıyanê bûn. Hemû tıştên grıng jı aliyê tebeqa hındık û dewlemend da dıhate meşandin. 3) DEMOKRASÎ: Dı vê dewletê da gotına hemû hemwelatiyan derbas dıbû, herkes xwedi dengdan û hılbıjartın bû. Hemwelati bıgehê ve dewletê ye. Weki ku me lî jor got; Platon lî dıji vê tipê dewletê gelek rawesta. 4) TİRANÎ: Ev tipê dewletê diktatoriya mıroveki ye, şerok, ango diktator hemû tışt e, heq, huqûq, mırovati lî gor daxwazên şerok dımeşe. Heqê tu kesi tune ku lî dıji şerok raweste, mırovati jıyan bı şerok ve heye. Lı gor Platon ew tipê dewletê xwe jı her babetê zeka, aql û zanebûnê dır xıstiye.

Dı pratikê da, Platon dewletek bı hêz, bı tebeqe, bı çin dıparast. Lı cem Platon û dewleta wi, Elit (xwedihez, zana, baş) xwedi ciheki baş bûn. Karê wan zanebûn û hunermendi bû, dı xebata ilmi û militer da hatıbûn pıjrandın. Ew mırovana meslehên xwe yê şexsi nedıfıkirin. Tıştê grıng jı bo elit, idarekırına dewletê bû, ev "xweşik bûn", "mêrxas bûn", "merd bûn" û hwd. Dı serê dewletê da elit hebû, piştıra suari, tucar, zenetkar, gundi dıhatın. Kole û jin lî dervayi dewletê bûn. Suariyan alıkariya filosofan dıkir û çanûn û nizam pêk danin. Tucar, zenetkar û gundi jı, dê bı problemên abori û qezenca xwe va mıjûl bubûna. Wan mırovana nıkaribû dewletê idare bıkın, idarekırına dewletê bes karê filosofan bû. Lı ser beşkırına dewlemendiye dı civatê da, prensibê Platon hebûn. Profesör S.E. Liedman dibêje ku, "Dewlemendi dı civatê da jı yekê pênc pêwist e. Dı navbêna hemwelatiyan da bê be-

lavkırın, dewlemendek bes dıkare pênc caran jı feqıreki, dewlemantir be (r.29)". Netica vê ditnên ev e: Jı aliyê madi da, feqên mezın zerar e. Newekhevi dı navbêna endamên civatê da problemên sosyal bı xwe ra tine, bıgehê dewletê xıra dıbe, mırov lı dıji hev şer dıkın û huzur dı civatê de namine. Jı ber vê yekê Platon jı bo dewlemendiya mırovana û ferqê madi hudûd danibû.

Dı civata platonik da, ferqêki piçûki (izafi) madi û ferqêki mezın manewi heye. Bıgehê civata platonik lî ser newekheviya manewi avadıbe

Kole û jin - jinên çına serdest jı - lı dervayi jiyana siyasi ne, dı dewleta platonik da, jin nezan in û kole jı "Fıraqên bıcan in", dıgot Platon. Kole pêwist e bes xebat bıkın û jı jiyana xwe memnûn bıın, heq û huqûq û serbesti jı kolan ra lazımbı. Wusa xuya dıke ku bıgehê ve dewletê, lı ser danustandinên dı navbêna kole û xwedi kole da esas gırtiye. Dı hiyerarşiya civatê da, hemû tebeqên sosyal, mırov, çin şına wan xuya ye. Mırov wesifa xwe û cihê xwe dıvê nazbıke. Platonizm ev e.

#### DAWÎ


Hêja ye ku em lı ser Platon bınvınsın ? Bı baweriya mırov nıvisarên wusa pêwist e pır bıbın. Teori, kultur, ideoloji, zanin bı ajıtasyon va pêk na yê. Em dıvê piçek xwe bêşının. Mırovati entellektuali û hezjêkırına jıyanê, bı naskırına civatên kevnare, bı fêrbûn, bı tégıhiştın û bı xebat jı bo civatek nû dıbe.

Em ê fêr bıbın û bıguherın û em ê bıguherın û fêr bıbın.

#### ÇAVKANÎ

- 1) Riyên Fıkrê (Tankens vagar), GUNNAR ASPELİN. CİLD I
- 2) Riyên Fıkrê (Tankens vagar), GUNNAR ASPELİN. CİLD II
- 3) İLMÊ YÛNAN (Grekisk vetenskap), BENJAMİN FARRINGTON.
- 4) Jı Platon heta Mao (Frân Platon till Mao) S.E. LİEDMAN.
- 5) Dewlet (Staten), Diyalog (Diyaloger), PLATON.

# XAÇERÊZ



## ÇEPERAST

- 1- Bî kurdi navek ji bo keçikan. - Tewirek reva hespan an keran.
- 2- Ne kevn (berepaş). - Bî zaravayê dimili (zazaki) ji rovi re tê gotin.
- 3- Lî Kurdistanê bajarek. - Mirov pê tenisê dilize. - Mêrê mangê (çêlekê) (berepaş).
- 4- Bê mekan, bê war.
- 5- Weki, mina. - Bî erebi ez.
- 6- Ne salê tê û ne par. - Vala. - Tewirek dar bî sitiriye.
- 7- Xas, (bî tırki ürün). - Lî hinek ciyan ji koxa mûrişkan re tê gotin.
- 8- Dî zimanê bîyanide navê Meyrê.
- 9- Gıryan (berepaş). - Lî hinek hereman ji agir re dibêjin (berepaş).
- 10- Şaireki bî navûdeng ji Sovyetê.

## SEREJÊR

- 1- Tewirek ajotina hespan, dî maneya babetek şirani ji tê bî kar anin. - Beradayi, perçe, xwe wendakiri.
- 2- Dî kurdi de ji Asiye re tê gotin (berepaş).
- 3- Bîşirin. - Bî zaravayê sorani zarok, gede (berepaş).
- 4- Bîlind, berz. - Herfek bê paşiyê wê gavê dibe ruh.

- 5- Bî kurdi navek ji bo keçikan.
- 6- Bê ruh, bê gan. - Dî zimanê bîyani de navek ji bo keçan.
- 7- Dî kurdi de pronavê pîrsê. - Mamo, Amo (berepaş).
- 8- Bî zaravayê sorani "dîbêje". - Kebile.
- 9- Lî Kurdistanê eşîrek ku navê xwe lî wê heremê ji kîrme. - Gava ku mirov kevır an tîşteki davêje dengê jê dertê, lî hinek hereman dibêjin "vîzin pêket" (berepaş).
- 10- Dî elfaba kurdi de xwendina herfeki (berepaş). - Bî zaravayê zazaki sêv (berepaş).
- 11- Erd, turab.
- 12- Navê lîstîkekê, wek golfê ye. - Beg, axa. - Lî hinek heremên Kurdistanê ji "ling" re tê gotin, lî ali qerejdaxê dî maneya "mîl" de tê bîkaranin.

BERSIVA HEJMAR 10'AN



Ewan jî çûne hukumate û gotin: "me derew kiriye mesela kuştina Axê awa ye". Mêrê Seyranê û kesên din ji mahkûmiyê xilas bûn.

Şevêkê birayê Seyranê hate gund bi niyeta ku jina xwe bikuje. Lê di serê xwe da got: "Ez ê bîngêhiya meselê hîn bibim, belkî derew be, min derdê sêwitiyê dîtiye, bila kurê min û keça min nebînin. Lê ku rastbe ez ê gulekî bi qurbana wê ji bikim". Di gund da kesên ji wan bawer bû ji wan pîrs kir, teva gotin: "na, ev dereweke mezin e û me nediye wî û jina te rojekê bi hev ra xeber jî dane". Ewî bawer kir ji wan û jina xwe ne kuşt.

Mala Axê xewnên ne xweş dibînin û ji tîrsa birayê Seyranê dilêrizîn. Jinên gund dora tendûrê pêşin didine Seyranê.



Çend meh derbas bûn, terq li gund ket. Bû qır û qiyamet, hawar û gazî. Birayê Seyrane li gundê mala Şêx hatiye kuştin, bi destê xulamekî mala Şêx, bi bêbextî li ser limêjê û bi tîfinga wî.

hezar hezar Rîzo esto"  
—Ena vaje, qe me vaje—.

\*\*\*\*\*

Înan dest da bîndestan heya merg,  
"Çizîkê zu may lît"  
û "gostê Xîzîri piya werd" bi inan.  
Nê tersay û tewa xwî tena nê gureti  
biy ganfiday Kurdan  
labelê viyarto rojê serek aşîran  
ow ewro, kor niyo ocaxê camerdan.

- (1) İbrahim: Lajê Seyid Rîza y.
- (2) çêneke: keyneki, keyna.
- (3), (4) Ni vatey deyîranê Dêrsîmi de vajiyêni.
- (5) Rayber: Yew casusê Hukumatê Tîrkan û birazay Seyid Rîzay bî.
- (6) Efendî: Embazê Rayberê Xayîni bî.



## BANG!

*Îro Rojhîlata-navin, di wareki pîr teng û dijwar da derbas dibe. Êrişî hêzên emperyalî, kevneperest, sîyonîst û faşîst dijî tevgera rîzgarîxwaza mîletên navçe her diçe xurt û gur dibe, destdirêjahîya wan jî xuya dîke. Îro emperyalî, bî taybetî emperyalîzma Amerîkî dijî mîletên Fîlîstîn, Lîbnan û Sûrîyê dek-dolabên nû digêrin. Ê dîxwazî hêzên pêşverû lî mîntîqê bî temamî jî hev bixî, bîndest bîkî, heta têk bîbî. Şerê Îran û Iraqê ku rejîma Seddam jî feyda emperyalî û kevneperestîyê agirê wê vêxîst, perçek jî planên wan e û heta îro berdewam e. Lî eynî wext ev plan û leyzo kên emperyalîstan lî ser tevgera rîzgarîxwaz a Kurdistanê jî xwe didî kîşê.*

*Di rewşek han da, bî dilêşî em dibîhsîn ku carek dî nî nav hîn hêzên netewî, welatparêz lî du beşên Kurdistanê da, bî taybetî lî Kurdistanî Iraqê dî navbera Yekîti Nîştîmanî Kurdistanî, Partî Demokrat Kurdistanî-Iraq, Partî Sosyalîstî Kurdistanî-Iraq û PASOK da şer û hevkuştî derketîye û hê jî dom dîke. Nîha jî me bîhîstîye ku, ev şer ber fîreh bûye û heta Karargeha Merkezîya Partî Komunîst a Iraqê jî gîrtîye hîmbêza xwe. Gîhîştîna şer heta vê derecê, em xeterek pîr mezî tê da dibînin. Bê guman ev xwîn rîjandî zîyanek mezî digîhîne gelê me. Jî ber ku ev hevkuştî dijî mîntîqê lî alîkê dîhêle û emrê rejîma xwînîrêj û şovenîst lî Baxdayê, ya ku bî temamî ketîye destê emperyalî û kevneperestên erebî, dirêj dîke.*

*Her weha şerê hevkuştî, lek û hêzên welatparêz qels dîke, mîlet jî xebat û pîştgîrîya pêşmerge dîlsar dîke. Ev şerana bê şîk bî kêrî dijî mîntîqê gelê kurd tî. Dijî mîntîqê jî van şerana şa û kêyfxweş dibe. Bî van kara rê tî dan kû, ew planên yê dijî gelî bîbî serî.*

*Gelî Hêzên Welatparêzên ku Şerê*

*Hevdu Dîkî !*

*Serhatîyên gelê kurd û her weha yê gelên cîhanê didî nîşandan ku, rîya serketîna xelka, YEKÎTÎ û HEVGIRTINA bîrû hêzên welatparêz e. Jî vê yekê em bangî hemû hêzên welatparêz dîkî: Ku şerê nav xwe rawestînin û mîlên xwe bîdî hevdu û bî hev ra berê tîfîngên xwe bîdî dijî mîntîqê gelê me. Problem û nelehevîyên nav xwe bî rîyek aşîtî û dan û sendînek bîratî çareser bîkî.*

*Em, partî û hêzên ev "BANG" ê îmza kîrîne, jî bo rawestandîna şer çî pêwîst e amadene ku pêrabin.*

*Em hêvîdarî ku hemû alîyên ketîne şer, guh bîdî vê BANG ê û rojek zûtîr, bê qeyd û şert şerê hevkuştî rawestînin*

*Heta şerê nav hêzên welatparêz raweste emê lî ser kar bî û jî bo ronahîkîrîna sedemên van bûyera jî bîxebîtin. Alîyên ku ketîbî şaşîya û gunehkarbî û jî vê rîya ku ne jî feyda gelê me ye venegerî, emê bî yek deng dijî wan rawestî wan rîswa bîkî !*

*Gelî hêz û kesên welatparêz, jî bo rawestandîna şerê hevkuştî dengê xwe bîlîndî û kar bîkî !*

*Partîya Demokrat Kurd Lî Sûrîyê "El Partî"  
Partîya Çepê Kurd Lî Sûrîyê  
Partî Hevgirtîna Gelî Kurd Lî Sûrîyê  
Partîya Demokratê Kurdê Sûrî  
Partî Demokrat Pêşverû Kurd Lî Sûrîyê  
Partîya Karkerên Kurdistan - PKK -  
ALA RIZGARÎ  
Rîzgarvanên Neteweyên Kurdistan - KUK -  
TÊKOŞÎN  
Partîya Pêşenga Karkerî Kurdistan - PPKK -  
Partîya Sosyalîst a Kurdistanî Tîrkîye - PSKT -*

*5 Gulan 1983*